



K.T

**ZANÎNGEHA MÊRDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZÏMANÊN ZINDÎ YÊN LÎ TÏRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANÏSTA ZÏMAN Û ÇANDA KURDÎ**

Projeya Lîsansa Bilind A Bêtez

Polînkirina Lîstikên Zarokan

Yên Herêma Mêrdînê

Cennet ÇELİK

21721012

Şewirmend

Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn, 2023

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisans Üstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum ‘‘Polînkirina Lîstikên Zarokan Yên Herêma Mêrdînê’’ adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kâğıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylıyorum.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.
- Tezimin/Projeminyıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

18.12.2022

Cennet ÇELİK

KABUL VE ONAY

Cennet ÇELİK tarafından hazırlanan “Polînkirina Lîstikên Zarokan yê Herêma Mêrdînê” adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, TEZSİZ YÜKSEK LİSANS PROJESİ olarak oy birliği/oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Mustafa ASLAN (Danışman)

.....

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK(ÜYE)

.....

Doç.Dr. Necat KESKİN(ÜYE)

.....

Doç. Dr. Ahmet Kırkan

Anabilim Dalı Başkanı / Enstitü Müdürü

NAVEROK

NAVEROK	III
PÊŞGOTÎN	V
KURTE	VI
ÖZET	VII
ABSTRACT	VIII
DESTPÊK	1
1.Mijar	2
2.Armanç	3
3.Girîngî	4
4.Rêbaz	5
BEŞA YEKEM	6
(PÊNASEYA LISTIK Ê BANDORA LÎSTIKAN LI SER GEŞEDANA ZAROKAN)	
1.1.LÎSTIK	6
1.2.GEŞEDANA MOTORÊ Ê BANDORA LÎSTIKAN.....	8
1.3.GEŞEDANA CIVAKÎ-HESTÎ Ê BANDORA LÎSTIKAN	9
1.4.GEŞEDANA ZÎHNÎ Ê BANDORA LÎSTIKAN.....	10
1.5.GEŞEDANA ZIMAN Ê BANDORA LÎSTIKAN	12
1.6. TAYBETMENDIYÊN LÎSTIKAN	13
BEŞA DUYEM	15
(DANASÎNA HERÊMA MÊRDÎNÊ Ê LÎSTIKÊN GELÊRÎ)	
2.1.DÎROKA HERÊMA MÊRDÎNÊ	15
2.2.GUND Ê MEZREYÊN BAJARÊ MÊRDÎNÊ	16
3.LÎSTIKÊN HERÊMA MÊRDÎNÊ	16
3.1.Dar û Pelik.....	17
3.2.Laga	17
3.3.Heftok	17
3.4.Heyv û Simbil.....	18

3.5.Xar(bilye)	18
3.6.Malik	18
3.7.Sobe	18
3.8.Sê Quçê.....	19
3.9.Qoqla	19
3.10.Çavgirtinkê	19
3.11.Çeqalîk.....	19
3.12.Teyare	19
3.13.Zîzok.....	20
3.14.Xazoz.....	20
3.15.Lîstikên ta	20
3.16.Heft kevir.....	20
3.17.Sêberg	20
3.18.Pêderxistinok	21
3.19.Hêklê meklê.....	21
3.20.Çizgî	22
3.21.Lîstikên topê	22
3.22.Can.....	22
3.23.Xanîk	23
3.24.Zo-fer.....	23
3.25. Nehberg	23
3.26. İstop	24
Tablo	25-26
ENCAM	28
ÇAVKANÎ	30
KESÊN ÇAVKANÎ	31-33

PÊŞGOTÎN

Lîstikên zarokan di jiyana zarokan de roleke sereke digire. Her çiqas formên lîstikan bi demê re bê guherîn jî, di bingehê de bandoreke erênî li ser geşedana zarokan pêk tîne. Lewra teorîsyenan hewce dîtiye ku, demek dirêj ji vê mijarê re veqetandine û li ser vê qadê lêkolînên têr û tije kirine.

Xebata me li ser lîstikên gelêrî yên herêma navenda Mêrdînê ye. Ev xebat berhevkirineke folklorîk û qadî ye. Armaneke vê xebatê ev e ku, lîstikên zarokan yên herêma Mêrdînê neyên jibîrkin û wenda nebin. Di heman demê de jî ji bo nifşên nû jê sud wergire bibe nimuneyeke nivîskî. Li gel van armancan, tesîra lîstikên zarokan li ser geşedana zihnî, zimanî, civakî û fizîkî hat ravekirin.

Di xebata me de 26 lîstik hatin berhevkin. Me 18 lîstik bi rêya hevdîtine, 8 komlîstik bi rêya çavdêriyê tomar kir. Heta ji destê me hat me resenbûna lîstikan xera nekir, lê belê têne li ser rastnivîsa wan hin sererastkirin pêk anî. Me di tabloyan de jî polînkirina lîstikan li gor cih û hejmarê nîşan kir.

Li gor lêkolînên me heta niha li ser lîstikên zarokan ên herêma Mêrdînê em rastî xebateke bi vî awayî nehatin. Ji bo bijartina vê mijara me ev rewş bû xaleke girîng.

Ji bo şêwirmendî û alîkariya wî ji mamoste Doç. Dr. Mustafa Aslanî re spas dikim. Di heman demê de ji wan duwanzdeh kesan re bi dil û can spas dikim ku ji bo hevpeyvînê deriyê mala xwe ji me re vekirin. Her wiha divê keda mamosteyên beşa ziman û çanda kurdî neyê jibîrkin ku di vê pêvajoyê de alîkariya xwe ji me kêr nekirin. Ji hemûyan re spasiyên xwe pêşkêş dikim.

Cennet ÇELİK

Mardin, 2022

KURTE

Ev xebat li ser lîstikên gelêrî yên navenda herêma Mêrdînê ye. Mijara me bi vê qadê sînorkirî ye. Heta niha li ser lîstikên herêma Mêrdînê xebat nehatine kirin. Kesên ku me bi wan re hevpeyvîn kirine çavkaniyên me yên sereke ne. Armanca me ew e ku heta ji destê me hat bi awayekî xwezayî lîstikên vê herêmê bê berhevkerin û tomarkirin. Herwiha bi vê helwestê hat xwestin ku ev lîstik jibîrkirinê û ji wendakirinê bîn xilaskirin. Di heman demê de ji bo folklorî zarokan jî bibe nimûneyeke nivîskî.

Me di vê xebatê de bi duwazdeh kesan re hevpeyvîn kir. Ev kesên ku me bi wan re hevdîtin kiriye temen û zayendên wan ji hev cuda ne. Me bi rêya hevdîtinê hijdeh lîstik, bi rêya çavdêriyê jî heşt komlîstik berhev kirin. Teswîr û rezîkê lîstikan jî bi zîmanekî zanistî û vekirî hat ifadekirin. Ji van lîstikan hinek li derve, hinek li hindir tînin. Hinek ji wan tenê keç, hinek jî tenê kur dilîzin, lê bi gelemperî bi hev re tînin.

Di encama vê xebatê de hat dîtin ku bajarê Mêrdînê ji bilî taybetmendiyên xwe yên çandî û curbicuriya gundên xwe, ji aliye lîstikên zarokan ve jî gelekî dewlemend e. Her wiha di xaleke din de hat fêhmkirin ku amûrên dijîtal, tevgerên malbatan, Pêşveçûyinên teknolojîk, bajarbûyîn û dibistanên fermî jî li ser pêvajoya guherîna lîstikên zarokan tesîreke mezin pêk tîne.

Peyvên Sereke: Lîstikên Gelêrî, Lîstik, Zarok, Geşedan,

ÖZET

Bu çalışma Mardin yöresine ait yerel çocuk oyunlarını kapsamaktadır. Konumuz alan ile sınırlandırılmıştır. Bugüne kadar bu alanda Mardin yöresine ait çocuk oyunları üzerine çalışılmamıştır. Kaynaklarımız tamamı ile sözlü olup görüşme yolu ile bilgi edindiğimiz kişilerdir. Amacımız elimiz geldiğince, doğal bir biçimde yörenin oyunlarını derlemek, gelecekte unutulup, kaybolmasını önlemektir. Aynı zamanda çocuk folklorü için yazılı bir kaynak sağlamaktır.

Bu çalışmada 12 kişi ile görüşme yaptık. Görüştüğümüz kişilerin yaşları ve cinsiyetleri birbirinden farklıdır. Mülakat yolu ile 18 oyun, gözlem yolu ile de grup oyunu derledik. Oyunların tasvirlerini ve kurallarını bilimsel ve açık bir dil ile ifade etmeye çalıştık. Oyunlardan bazıları içerde, bazıları dışarda oynanırken, bazıları sadece kızlar, bazıları sadece erkekler oynar, fakat genel olarak oyunların birlikte oynandığı görülmüştür.

Çalışmanın sonucunda Mardin ilinin kültürel özelliklerinin ve köylerinin dışında, çocuk oyunları açısından da zengin olduğu görülmüştür. Başka bir nokta ise; dijital araçların, aile tutumlarının, teknolojik gelişmelerin, şehirleşmenin ve okulların çocuk oyunları üzerinde büyük bir etkisi olduğu görülmüştür.

Anahtar Kelimeler: Anonim Halk Oyunları, Oyun, Çocuk, Gelişim

ABSTRACT

This study covers the local children's games belonging to the Mardin region. Our subject is limited to the field. Until today, there has been no study on children's plays belonging to the Mardin region in this area. Our sources are completely verbal and are the people we get information through interview. Our aim is to compile the plays of the region as naturally as we can and to prevent them from being forgotten and lost in the future. It is also to provide a written resource for children's folklore.

In this study, we interviewed 12 people. The ages and genders of the people we interviewed are different from each other. We compiled 18 games by interview and group games by observation. We tried to express the descriptions and rules of the games in a scientific and clear language. While some of the games are played indoors, some are played outside, some only girls and some only boys play, but it has been seen that the games are generally played together.

As a result of the study, it has been seen that Mardin province is rich in terms of children's games, apart from its cultural characteristics and villages. At another point; It has been seen that digital tool, family attitudes, technological developments, urbanization and schools have a great impact on children's play.

Keywords: Anonymous: Folk Dances, Play, Child, Development

DESTPÊK

Her netew di sinorên xwe de xwediye çandeke dewlemend, hêja û taybet e. Di çand û jiyana mirovan de listik bi taybetî listikên zarokan roleke girîng digire. Ew zarokên ku ji aliye listikan ve hişê wan têr û tijê; kesayetên bihêz, pêşketinên ronî, bîrewêrî, û hunerên civakî pêk tînin. Zarok her li ku derê bijîn divê ji bo listikên wan, pêşveçûyina geşedana wan hin derfet bîn avakirin.

Di Danzana Neteweyên Yekbûyî ya Mafên Zarokan(1959) de yekem carê ‘‘mafên listikê’’ bi distûreke çaremîn hat ravekirin. Ji bo zarokên hemû cihanê listik weke pediviyekê hatiye dîtin û bi biryarekê fermî hatiye qebl kirin. Di vê daxuyaniyê de jî eşkereye ku ji bo pêşeroj û geşedana zarokan listik roleke sereke digire. Gelek pişporên vê qadê li ser listikan rawestiyarin û listik di çarçoveyekê de dabeş kirine. Di vê xebatê de dê li ser polînkirina listikên zarokan yê herêma Mêrdînê bîn sekinandin. Di polinkirirînê de cih(derve-hindir), hejmar(tenê-komî) listikên biamûr-bêamûr hatin nirxandin. Di perwerdeya zarokan de cihê listikan bi girîngiyekê hatin diyar kirin. Çavkaniyên listikan gelemperî bi devkî ne û bi rêya mullaqatê hatin bidestxistin.

Pêşketineke serkeftî; zarokên ku zarokatiya xwe bi dilekî xweş derbas kiribin, di bandora êş û kulan de nemabin, bi dê û bav û hevalên xwe re demên aram derbaskiribin derdikeve holê. Heger ku mirov civateke biriqandî û serkeftî bixwazin, divê dile zarokan, binhişê zarokan, hest û xeyalên zarokan azad û aram bikin. Bêguman dê pêşeroja zarokan bi vî awayî bigihîji asteke bilind.

Hînkirina listikan û berdewamkirina listikan ji bo çanda mirovan gelekî girîng e. Ji aliye polîtîk erdnîgarî û civakî mirov li jiyana kurdan binêre, eşkereye ku kurd ji her gelî bêhtir pêdiviya wan bi perwerdekirina zarokan ya bi rêya listikan ve heye. Ji ber ku hemû nirxên gelan bi rêya zarokan li ser ruyê cihanê mayînde dibin û hebûna xwe bi vî awayî diparêzin. Pêşketin û xurtbûna xwe bi saya zarokên bîrewer didomînin.

Mijar

Lîstik ji keresteyên folklorê ne. Kesên ku ji çand û hunera xwe bêpar bijî, pêkan e ku ew ê di dîrokê de têk biçe û bê jibîrkirin. Ji ber wê, dive mirov ji hebûna xwe hayedar bin, da ku mayînde bimînin. Pewîst e ku weke her gelî Kurd jî li ser qada folklorê lêkolînên zanistî pêk bînin. Di vê xebatê de ji bo parastina lîstikên zarokan ev mijar hat bijartin. Lewra mijara me “Polînkirina Lîstikên Zarokan Yên Herêma Mêrdînê”ye. Polînkirina vê xebatê li ser hejmar û cihe ku zarok tê de dîlîzin e. Weke tê zanîn lîstik di jiyana û tevgerên zarokan de cihekî sereke digirin geşedana zarokan pêş dixin. Ji bo geşedana wan ya fizîkî, zihnî, zimanî û hestî-hestiyarî girîngiyeke mezin tîne ber çavan. Ji ber girîngiya vê xalê em li ser mijara lîstikan û polînkirina lîstikan sekinîn.

Armanc

Herêma Mêrdînê ji aliyê çand û hûnerê gelekî dewlemend e, lewra hêmanên vi bajarî ên folklorîk curbicur e û têra xwe heye. Me jî di vê xebatê de hêmana “lîstikê” bijartîye. Sînorên lîstikan li navenda herêma Mêrdînê ve girêdayî ye. Lîstik di jiyana zarokan de roleke çawa digirin, girîngiyên lîstikan çi nin, di heman demê de jî taybetmendiyên lîstikên herêma Mêrdînê hatin ravekirin. Li gel van xalên girîng, lîstik li gor cih û hejmara kesan çawa tê guhertin, lîstikên komî û yê bi tena sere xwe çawa tên lîstin hatin nîşankirin. Me di vê xebatê de xwest ku, lîstikên zarokan ên kevna û qedîm berhev bikin, da ku ji zarokan re di pêşerojê de bibe nimûneyek nivîskî û neyên jibîrkirin.

Girîngî

Edebiyat û folklorazarokan li cihanê xwedî girîngiyeke mezin e. Ev xal ji bo folklorazarokên kurd jî derbasdar e. Lê heta niha li herêma Mêrdînê lêkolînen di derbarê lîstikên zarokan de em rastî wan nehatin. Me xwest ku bi rêya vê xebatê hinekî rê lê bê vekirin. Girîngiyeke din jî ev e ku xebatên ji bo zarokan hatine kirin, yekî din li ser zêde bibe weke nimûneyeke nivîski di arşîvan de cih bigire. Mirov şahidiye dike ku, zarok bi saya lîstikan di civakê de xwe eşkere dikin û hest û xeyalên xwe bi vî awayî îfade dikin. Ev jî girîngiya mijara me derdixe holê.

Xebate me ji du beşan pêk tê, di beşa yekem de em li ser pênaseya lîstikê, bandora lîstikan li ser geşedana zîhnî, zimanî, hestî-civakî û fizikî rawestiyan û di dawiya de jî taybetmendiyan lîstikan hatin rêzkirin. Di beşa duyem de em li ser dîroka Mêrdîn, gund û bajarokên wê sekinîn. Piştî lîstikên ku bi rêya hevpeyvînê hatin berhevkirin bi awayekî zanistî hatin danasîn. Ji bo resenbûna lîstikan xera nebin me tenê li ser wan rastnivîsên biçûk kirin.

Rêbaz

Hemû xebat û lêkolîn di hindirê xwe de hin astengiyan dihewînin. Piştî mijar ji aliyê literaturê ve hinekî qels e, teknîka “hevpeyvîn” û “çavdêriyê” hat hilbijartin. Çarçoveya xebata me ji navenda Mêrdînê pêk hatîye. Herêma Mêrdînê ji aliyê gundan ve gelekî fireh e, ji ber vê yekê derfetên me ne gihîşte ku em yek bi yek li gundan bigerin û lîstikan berhev bikin. Ji bo berhevkirina lîstikan, kesên ku ji gundên Mêrdînê koç kirine û hatine li navenda Mêrdînê dijîn, me ji wan kêsan agahî stendin. Me li gel mezinan metoda “hevpeyvîn” ê; li gel zarokan jî metoda “çavdêrî”yê bi kar anî. Di komlîstikan de bi gelemperî metoda çavdêriyê hat bikaranîn.

Di xebate me de pirsgirêka herî mezin ew e ku di vê qadê de peydabûna çavkaniyên nivîskî bûn. Çavkaniyên me bi gelemperî devkî ne û li gor hin kesan lîstik dihatin guhertin. Me resenbûna lîstikan xera nekirin, tenê li ser lîstikan rastnivîsên biçûk kirin.

Ev lîstik û keresteyên vê xebatê di sala 2021an de hatine berhevkirin. Vebêjerên van lîstik û keresteyan duwanzdeh (12) kes û bi giştî bîst û şeş (26) lîstik in. Di literaturê de em rastî xebatên lîstikên “Herêma Silopiyayê”, “Herêma Hekariyê” hatin lê di derbarê lîstikên herêma Mêrdînê de me agahî bi dest nexistin. Ji ber vê rewşê ev mijar ji bo me girîng bû. Heta ku ji destê me hat me bi awayekî resen cîh da lîstikan. Hem ji ber bêderfetiya aborî, ewleyî û demî, hem jî ya teknîkî dibe ku me hemû şiklên van lîstikan berhev nekiribin.

BEŞA YEKEM

(PENASEYA LÎSTİK Û BANDORA LÎSTIKAN LI SER GEŞEDANA ZAROKAN)

Lîstik di pêşvêçûyina zarokan de cihekî girîng digire. Lewra di vê beşê de li gor lêkolîneran pênaseya lîstikê hat ravekirin. Di heman demê de tesîra lîstikan li ser geşedana zarokan ya motor, zihni, zimanî û hestî-civakî hat diyarkirin. Di dawiyê de jî taybetmendiyên lîstikan hat nîşan kirin.

1.1.LÎSTİK

Weke her mijarê dîroka lîstikan jî kûr û dûr e; ji çêbûna mirovatîyê heya roja me, nişaneyê heyîna însanan diyar dike. Li gor daneyên arkeolojîk ji aliyê curbicurî û dewlemendiya lîstik û kelûpelên lîstikan, yekem çavkaniyên ku tên zanîn ji aliyê Misriyan ve hatiye bikaranîn. Li Misrê (B.Z. 2600), li ser dîwarê Gora Ak-horê wêneyek hatiye xêzkirin ku di vê wêneyê de keçikek biçûk lîstika “çepikê” dilîze. Hespera text, zîzok, lîstikên xara, ji gorên Fîravûnan bûkên zarokan û hwd. ev lîstikên ku zarokên Misriyan listine, dişibe lîstikên me yê iroyîn. Di berhemên Yewnanî de wêneyên lîstikên kaxezan, lîstikên topê û tableta “tavla”yê hatine peyda kirin. Li Anatolyayê, li Mereşê ji aliyê Hîtiyan ve kab û wêneyên ku tê de zarok dilîzin, hatine dîtin. (Canlı&Demiraslan, 2020, r.62) Ev bermayî û belgeyên hatine dîtin nîşanî me dide ku dîroka lîstik, pêlîstok û lîstinê gelekî kevn e.

Di edebiyata zarokan de û di folklorê de lîstik cihekî sereke digire. Lêkolînerên ku yê di qada zarokan de xebitîne li ser lîstikan pênaseyên xurt kirine.

Li gor Huîzînga lîstik “berî ku mirov ji xwe re çandeke ava bike, bi hezar salan bêre lîstik derketiye holê. Ji çanda mirovatîyê kevintir e. Di heman demê de ji bo pêlîstokan jî ev tişt tê gotin. Li gor xebatên arkeolojîk hatiye dîtin ku dîroka lîstik û pêlîstokan bi hebûna mirovatîyê ve girêdayî ye.”(Altınışık&Sümbüllü,2005,r.3-5)

Montaigne dibêje ku “lîstik karê zarokan e.”

Di qada geşedana zarokan de xebat û teoriyên herî baş hatine kirin. Piagetî jî ji van lêkolînerên qedirbilind e. Ew jî li ser lîstikan wiha dibêje “zarok serpêhatî, agahi û tegîhiştinên xwe bi hev ve girê dide, weke diyardeyekê derdixîne hole.” (Sevinç, 2009,r.71)

Yörükoğlu dibêje ku “lîstik azadiya zarokan e, di hindirê zarokan de çî huner hebe, hişyar dibe û geşedana zarokan pêş dixê.” (Bedirhanoğlu,2011,r.25-26)

Froebeli; “Lîstik, ji bo geşedana zarokan rêya herî pêşketî ye. Jixwe lîstik tecrubeyeka jixweber dibexşîne zarokan. Daxwaza lîstikê bi awayekî siruştî di zarokan da derdikeve holê û herwiha dibe sedema dîtina heyîna navxweyî ango bixwehesînê. Di vê serdemê da lîstik ne wextderbaskirineka bêmane ye ew mijûliyeka pir cidî û girîng e.” (Subaşı,2021,r.5-6)

Ji bo ku mirov nirxeke bilind nişanî zarokan bide, rêya herî baş lîstik e. Ji ber ku dema zarokan kêfxweş dikin, di heman deme de normên civakê yên sereke jî bi dest dixin. Di lîstikên zarokan yen kevneşopî de di bingehe de zarok du fonksiyonan dibînin. Yekemîn; lîstikên ku piştgiriye didin geşedana fizîkî û hişî. Mînak, lîstikên ku bi zûgotinokan dest pê dikin, geşedana ziman û ragihandina zarokan pêş dixin. Ya duyemîn lîstikên kevneşopî ne ku mezinên pêşerojê diyar dikin. Di heman deme de civaka ku tê de dijî nirxên wê bi dest dixê. (Altınışık&Sümbüllü,2005,r.8-11)

Jean Piaget jî serê xwe bi təkiliya di navbera lîstikan û gîhandina zarokan de gelekî êşandiye. Li gor Piaget lîstik, pêvajoya lihevkirina (adapte) zarokan a li gel her tiştî ye. Zarok her roj rastî tiştên nû tîn; gava rastî tiştên nû tîn, dengeya wî/wê xira dibe. Piştî dîsa adaptasyona xwe pêk bîne divê van tiştên nû nas bike û organîze bike. Lîstik di vê pêvajoyê de wekî amûreke alîkarîya zarokan dike da ku adapteyî jiyanê û tiştên nû bibe. (Çocuk Gelişimi Modülü, 2019,r.130-132).

Zarok dema ku lîstikê dilîze ew rolên ku weke dê-bav, keçik-lawik tîne ser xwe; bi saya van rolên sereke nasnameya xwe ya zayendî bi dest dixê. Dîsa di malbata xwe de tiştê ku jê berpirsiyar be, bi rêya teqlidê pêk tîne. (Akın,2021,r.4-5). Di lîstikan de rolgirtin heye. Bi vî awayî dema ku zarok dikevin şûna zarokê din yan jî dikevin rola bijîşk, perperok û tişteki din, pir zêde motîve dibin, yan jî bi zarokan re empatiyeke

xurt çêdibe. Zarok di lîstikan de berpirsîyariyên xwe dizanin û herwiha xwe mecbûr hîs dikin ku li firaqên xwe (gog, ben, kevir, dar, tîr û kevan û hwd) xwedî derkevin.

1.2.GEŞEDANA MOTORÊ Û BANDORA LÎSTIKAN

Geşedana motorê, ligel pêşketin û mezinbûna fizîkî ve piştî encama geşedana mêjî û mêjîpiştê, organîzma bi daxwaziya xwe dibe xwedî hereketek (Artan&Îsmihan,2012,r.168-169). Her wiha li ser van tevgeran bi bandor e û fêdeyên lîstikan hene.

Geşedana bedenî; dirêjbûna bejnê, kîlogirtin, geşedana lemlate, hestî, mejî, endamên sehêkî bi kurtasî geşedana hemû endamên laşî dihewîne. Tuğrul bo geşedana psîko-motor wiha dibêje:”Piştî mezinbûn û geşedana bedenî, mejîpişt (omurilik) jî geşbûna xwe temam dike. Piştî vê temambûnê laş behremendiya her cure liv û tevgerê bi dest dixê. Ji vê yekê re geşedana psîko-motor tê gotin.”(Başak, 2019, r.64-65).

Di bingeha helwestên mirov de hin merheleyên bîyolojîk ên diyar hene. Sîstema tureyê ji dewra berêya zayînê dest pê dike, heta emre gihaştî(adolescence, kahilî) ya ciwan ve wekî binyadî û fonksiyonel devam dike. (Pertev, 2008,r.35). Her wiha li gel geşedana fizîkî, lebatên hindirîn jî pêş dikevin. Di salê 3-6an de geşedana hûnerweriyên motor jî nêzîk ve tekîldar e. Geşedana fizîkî û geşedana motorê di hindirên xwe dibin du beş; yekem hunerên masûlkeya tenik, bikaranîna tilî û destan e. (nivîsandin, çirandin, xêz kirin, wêne çekirin). Duyem hunerên masûlkeya hişk; avêtin, revîn, zîvirandin hwd. (Artan&Îsmihan,2012,r.176-179). Ev hunerên bingeîn divê dor bi dor, li gor geşedan û temênê zarokan bê bidestxistin. Dîsa di navbera 3-6 salî de divê zarok du babêtên girîng ên geşedanê hîn bibin; yek lixwenêrîn û paqijîya rojane, ya din jî bi awayekî baş bikaranîna kordinasyona dest û çavan e. (Pertev, 2008,r.43-44). Hin fêdeyên lîstikên zarokan ên li ser geşedana motorê ev in;

- Sîstema behngirtinê, gerandina xwînê û serifandinê bi awayekî xwezayî dişuxilîne.
- Di laşê zarokan de rûnê zêde û enerijya zêde mayî diavêje derve.

- Zarok bi saya lîstikan hunerên laşê xwe dibînin û xwe kontrol dikin.
- Ji bo obezîteyê parastineke bikêrhatî çêdike.
- Koordinasyona dest û tiliyan pêk tîne.
- Masûlke û hestiyên zarokan xurt dike. (Nişêyên Zanengeha Hacettepeyê, 2015, r.6-7)

1.3. GEŞEDANA CIVAKÎ-HESTÎ Û BANDORA LÎSTIKAN

Mirovên di geşedaneke normal de be eşkereye ku dibe xwediyê hestên bingehîn. Hestên mirov fonksiyonekê wê heye ku kesên bi awayekî xwezayî adapteyî jiyaneke dike. Hest di buyerên guhertî de û li dijî serpêhatîyan weke bertekekê derdikevi holê û di her kesayetî de reaksiyonên cuda pêk tîne. Mînak; li pêşberî mirinekê hinek bihêz, girî û qirînê li xwe dikin, hinek kes jî bi awayekî xwînsar disekin. (Bayhan&Artan, 2013, r.217). Diyare ku nîşana insanetiyê hestê wî/wê ye. Ev xal jî bo zarokan jî derbasdar e. Zarok di jiyana xwe ya rojane de, di dibistanê û di lîstikên xwe de, pêwîst e ku hest û xwestekên xwe diyar bikin. Zarokên ku aruzeyên xwe, xeyalên xwe bi awayekî rehet diyar bike, ew dê di pêşerojê de bibe miroveke jixwebawer.

Du salên pêşî jî bo geşedana zarokan gelek kirîtik in ku hesta bawerîya bingehîn li vê dewrê pêk tê. Di navbera mehên 6-9an de malbata xwe hêdî hêdî nas dike. Dayik dema ku pewistiyên zarok bi cih tîne, di heman demê de bingeha hesta bawerîya bi xwe û bi hawirdora xwe re jî çê dike. Di zarokan de têgeha “ez” piştî sê salî dest pê dike yanê teghiştineke xwenvendîti(egosantrik, bermerkezci) heye. Eger dê û bav têra xwe eleqe û hezkirinê bidin zarokê xwe, dê rumeta xwebûnî ya wî/wê baş û musbet be. (Pertev, 2008, r.37-38).

Zarok her ku temenê wî/wê mezin dibe ji aliyê civakîbûne de jî pêş dikeve. Zarok 3-6 salî de weke gihîştîyan dikarin xwe ifade bikin, mezinên xwe dikarin minak bigirin, di navbera xwe de dikarin hevkarîyê, piştevanîyê û biratîyê pêk bînin. Lewra bandora lîstikan jî di tevger û geşedana hestî-civakî de roleke girîng digire. Hin fêdeyên lîstikên zarokan ên li ser geşedana hestî-civakî ev in;

- Xwebawerîbûn, xweşbînî û hesta qebûlîkirinê pêş dixin.
- Rolên zayendan hîn dibin û li gor wan tevgerê distînin.
- Destûr û qaideyan dipejirînin.
- Hunerên pêşengîtiyê bi kar tînin.
- Di jiyana de rolên civakê, rolên dê û bavên xwe hîn dibin.
- Fîkr û ramanên xwe, hest û xeyalên xwe transferî amûran û objeyan dikin.
- Serpêhatiyên xwe, hestên xwe bi saya lîstîkan eşkere dikin.
- Çareserîkirina bûyeran tevlihev hîn dibin.
- Bi lîstîkên civakî-dramatîk hunerên empatiyê geş dibin.
- Bi saya lîstîkan alîkarî, ragihandin û parvekirinê fêr dibin.
- Zarok, di lîstîkên xwe de ji bo ku bigihîjin armancên xwe yê hevpar, di navbera xwe de hevkarî û piştevaniyê ava dikin. (Nişeyen Zanîngeha Hacettepeyê,2015,r.9-11).

Her wiha lîstîk ji bo geşedana zarokan ya fizîkî, zîhnî û zimanî û geşedana civakî roleke girîng digire.

1.4.GEŞEDANA ZÎHNÎ Û BANDORA LÎSTIKAN

Tefekkür, çêkirina têgîni têkilîdanîna di navbera bûyeran, çareserîkirina probleman û neqilîkirina zanyarêyan di nav geşedana zîhnî û ziman de ne. Zarok tişt û buyerên hawirdora xwe îdraç dikin û her wiha dibîşîvînin. Piştî van hûrgilîyan hevyeke dike, li hev tîne. (Pertev, 2008, r.38-39). Di geşedana zarokan de, geşedana zîhnî cihê sereke digire. Tesîra xwe li ser hemû geşedanên din jî dike. Diyar e ku di hemû tevgerên me de bandora hişê me heye. Her wiha jiyana mirovan bêguman bi hiş ve girêdayî ye.

Zarok bi naskirin û kişîfîkirina amûrên derûdora xwe serkeftina pêşîn ya geşedana hişî tahm dikin. Ev tahm ji bo zarokan pêvajoyeka dijwar û bêhempa ye. Ji

bo pêşveçûna hişî ya bi kiryarên fêhmkirin û hînbûna cihanê pêk tê, geşedena hişî dihê gotin. Ev geşedan ji pitiktîyê dest pê dike û heta dimire dewam dike. Herwiha ew pêvajoya bibandor ya naskirin, fikirîn û hînbûna zarokan ya derûdor û cihanê ye. (Sönmez, 2000, r. 90).

Ji xebatên geşedana hişî ya zarokan, xebata herî bibandor ya Jean Peagetî ye. Peagetî li gor çavdêrî û tecrubeyên xwe geşedena hişî bi çar serdeman pênase kirîye. Li gor wî geşedana hişî li gor van serdeman bi awayên cuda bi pêş ve diçe. Serdema motor-sehekî (0-2), serdema berî kiryarîyê (2-6), serdema karên şênber (6-11) û serdema karên razber (12-16). Serdema motor-sehekî ji zayîna zarokan heta du salîya zarokan dewam dike. Zarokên vî wextî her ku diçe bi derûdora xwe ra zêdetir li hev dikin. Ji alîyê hunerên hişî ve nafikirin û nizanin, herwiha ne jî xwedî hunereka axiftinê ne, lewra bi piranî ji alîyê tevgerên xwe yê motor-sehekî ve dizanin û difikirin. (Güneş, 2021, r.100-101)

J.Pagetî li ser geşedana zarokan, di derbarê geşedana zîhnî de teorî û xebatên gelekî bikêrhatî û giranbiha ji me re mîrate hiştiye. Herwiha ji nivîsandina teorî û lekolînên Piagetî heya roja me em nerînên Piagetî bikartînin.

Xebatên li ser lîstikên zarokan hatine kirin nîşanî mirov dike ku, bandoreke mezin li ser geşedana zîhnî jî kiriye. Hin fêdeyên lîstikên zarokan ên li ser geşedana zîhnî ev in;

- Lîstik li ser zarokan hesta keşifkirinê û meraqê pêş ve dibe.
- Di navbera obje û alavan de polînkirin û pênaseyan dikin.
- Rêzkirina bûyeran hîn dibin.
- Giştîkirina agahiyan pêk tînin.
- Fîkr û ramanên razber diafirînin.
- Tegîhîştinekê di navbera sedem û encamê dimeşînin.
- Têgînê nû bi dest dixin.
- Pirsgerêkên xwe bi awayekî xwezayî çareser dikin.

- Di navbera objeyan şibandin û cudatiyan fêr dibin. (Nîşeyen Zanengeha Hacettepeyê, 2015, r. 9-11).

1.5.GEŞEDANA ZIMAN Û BANDORA LÎSTIKAN

Ziman; hest û raman, xwestek û arûzûyan bi rêya nivîs an jî bi jest û jargonan îfadekirin e. Zarok, derûdora ku tê de dijîn, ji bo ku pêdiviyên xwe pêk bînin pêşi hêmayan û dangan piştre navê alavên ku yên di jiyana xwe de bikartînin hîn dibin. Piştî dubareyên dûdirej peyvên ku hîn bûne bi hev ve girê dide û hevokên dirêj ve saz dikin. (Gülyüz, 2013, r.37-38)

Zarok di 3-4 salîya xwe de zêdetir hînî peyvên dibin. Ji aliyekî ve hînî peyvên nû jî dibin, ji aliyê din ve jî peyvên ku dizanin zêde bi kar tînin. Pîranîya zarokan di vê serdemê da hînî zimanê xwe yê zikmakî dibin. Dikarin bi zimanê xwe, xwe îfade bikin. Bikaranîna zimanî pîralî ye. Hestên xwe, fikrên xwe û têkilîyên xwe di vê serdemê de vedibêjin. Carinan jî xwe bi xwe diaxivin. Nêzî hezar peyvên dizanin, jixwe zarok di çar salîya xwe de ji aliyê gramerê ve asta xwe temam dikin. (Yavuzer, 2018, r. 88-92).

“ Oztürk dîyar dike ku derheqê hînbûna zimanî ya zarokan da nêrînê cuda hene. Yek jê nêrîna psîkolînguîstîk e. Ev nêrîn qebûl dike ku her zarok wexta ku çêdibin xwedî mekanîzmeyeka taybet in ango zarok bi xêra vê mekanîzmayê hînî zimanî dibin (Chomsky, 1969) nêrîna din jî teorîya hînbûnê ye. Li gor vê nêrînê zarok bi teqlît, perçînkirin û bi xelatan hînî zimanî dibin (Skinner, 1957) nêrîneka din jî teorîya hişî ye. Li gor vê nêrînê zarok bi pêşveçûna hunerên hişî hînî zimanî dibin. (Bloom, 1995) Gelek nêrîn hene lê em dikarin bibêjin ku nêrînê derheqê hînbûna zimanî da, nêrînê sereke ev in. (Vgz. Güneş, 2021, r.100-101)

Li ser geşedana ziman gelek teorî û teorîsyen hene. Di nav wan de yê herî navdar Noam Chomsky e. Li gor Chomskyî mirov dema ku tîn dinyayê xwedî mekanîzmeyeka zimanî ya taybet in. Ziman ew pêvajoyê ye ku zarok xwe bi xwe pêk tînin. Ji bo axaftinê hewcedarî bi bihistînê heye. Li gel van tiştan jî, pîvan û bingeha zimanî li gor kapasîteyên xwe hîn dibin. (Güneş, 2021, r.101-102)

Geşedana ziman têkel û girîft e. Lê bele kê m zarok hinî ziman nabin. Di geşedana ziman de ancax ji %2 ê wan ji ber sedemên taybet paş de dimînin. Yanî di bin şertên asayî de mumkin nîne ku zarok zimanê dayik hîn nebe. (Pertev, 2008, r.53-54)

Li gor rewşenbîran tevgerên malbatan û şiyarkerên derûdorê li ser zarokan bandoreke girîng pêk tîne. Zarokên ku ji aliyê geşedana ziman ve paş de mabin, di kesayeta wan de xwenebawerîbûn pêk tê. Lewra ev xwenebawerîbûn di derûniya zarokan de rewşên neyinî çê dikin. Zarok xwe ji civakê dûr dixin, di hindirê xwe de dinyayeke bi tena serê xwe ava dikin. Ev xalên bingehîn di zarokan de hin kêmasiyan jî bi xwe re tînin. Pêşveçûna ziman di jiyana zarokan de, xaleke bingehîn e. Her wiha, lîstik li ser geşedana zarokan ya zimanî jî roleke girîng digire. Hin fêdeyên lîstikên zarokan ên li ser geşedana zimanî ev in;

- Gencîneya pêyvvan geş dikin.
- Hevokên dirêj pêk tînin.
- Hunerên ragihandinê pêş dixin.
- Hunerên xweîfadekirinê û vegotinê pêş ve dibin.
- Bi saya lîstikan li gor çandê û civakê zimanekî bikêrhatî derdikeve holê. (Nîşeyên Zanîngeha Hacettepeyê,2015,r.8-9).

1.6. TAYBETMENDIYÊN LÎSTIKAN

- Bi gelemperî di hindirê xwe de mebestekê dihewîne.
- Ji ber xwe ve derdikeve holê.
- Dema lîstikan û sînoren lîstikan hene.
- Bi rêzik an bê rezik dikare bên lîstin.
- Di lîstikan de tecrûbeyên zarokan gelek caran tên dûbarekirin û tiştên nû tên ceribandin.
- Lîstik çawa biencam bibe çawa berfireh bibe ji serî de naye zanîn.
- Carîna ji jiyana rasteqîn de dikarin dûr bikevin.

- Kêfxeşiyê û dilrehetbûne didin zarokan.
- Lîstik rolên jiyânê, kar û barên mirovan nişan didin.
- Lîstik pêvajoyeke zindî û dînamîk e.
- Lîstik ji derve mudahaleyên napejirîne.
- Lîstik baldarbûne û kordinasyonê dixwaze.
- Zarok di lîstikan de, di ewlehîyê de ye, ji ber vê yekê motîvasyonê wê/wî bilind dibe.
- Zarok pêşvêçûyîna têgeh û bi wêjan pêk tînin. (Sevinç, 2009, r.28-29)

Di taybetmendiyên jorîn de mirov dibîne ku lîstikên zarokan ne tiştêkî ji rêzê ye. Di jiyana zarokan de bandoreke mezin çê dibe. Zarok bi saya lîstikan bi deme re kesayeta xwe hêdî hêdî geş dikin. Dema ku zarok dilîzin, ew agahiyên ku didin hevdu û distînin, mayînde dimîne. (Oyun ve Oyuncak Modülü, 2016, r.2-3).

Lîstikên bi hev re tînin lîstin di navbera zarokan de tekîliyêkê xurt pêk tîne. Ji bilî van, girêdaneke erênî, hevparî, xweşî û hevaltiyê jî bi awayekî xwezayî derdixe meydanê.

Hînbûna meşê û bazdanê ji bo geşedana zarokan ya motor û fîzîkî cihêkî girîng digire. Zarok dikarin ji hemû amûr û tiştên wekî din lîstikan derbixin. J.J.Roussesau di derbarê dînamîkbûna zarokan wiha dibêje. “Ji bo zarokan mala ku tê de dijîn; dinyayeke gelekî mezin e. Bi nerîna zarokan; pişt derî, binê derencan, dolabên veşartî, deriyên girtî, hemû beşên malê ji bo wan cihên keşîfîkirinê ne. Zarok bi saya van tiştan têgehên weke sar-germ, hişk-nerm, sivik-giran hîn dibe.” Weke ku tê gotin, lîstik ji bo zarokan bê sînor e. Mereq û keşîf bi hev ve girêdayî ye.

Lîstikên zarokan huner û berhemên sereke ne, di nav kereste û mîrateyên folklorê de. Ji ber ku lîstikên zarokan yek ji wan huneran e ku ji bo neqilîkirina çand, tore, adet, nirx, reng û rewşa miletekî di navbera nifşên cuda da wezîfeya pirê pêk tînin. Herwiha di geşedana zarokan ya fîzîkî, zîhnî, zimanî û exlaqî da tesîreka lîstikan ya mezin heye ku îro bê guman her kesê wê nêrîna qebûl dibe. Lewra lîstikên zarokan yê qedîmî piralî ne û dibe ku ji gelek alîyan ve bînin nirxandin. (Subaşı, 2021, r. 13-15) Em ê jî li gor nerînan li ser lîstikên zarokan yê qedîmî yê li herêma Mêrdînê bisekinin.

BEŞA DUYEM

(DANASÎNA HERÊMA MÊRDÎN Û LÎSTIKÊN GELÊRÎ)

Lîstikên zarokan di folklorê de huner û berhemên sereke ne. Ji ber ku lîstikên zarokan ji bo veguhestina çand, ziman, nirx, reng û rewşa gelekî di navbera nifşên cuda de pêwira pirê pêk tîne. Di vê beşê de me dirokçeya herêma Mêrdînê û danasîna bajar û gundên wê bi kurtasî ifade kir. Navê van lîstikan her çiqas bi giştî wekî lîstikên zarokan xuya bikin jî, ji kesên ciwan dest pê dikin heya mirovên navser berdewam dikin lewra li şîna wê me têgeha lîstikên gelêrî nirxandî. Di vê beşê de 26 lîstik hat berhevkirin, navê van lîstikan bi kijan navî hatibe gotin, bi halê xwe yê resen hat îfade kirin.

2.1. DIROKA HERÊMA MÊRDÎN

Li ser navê bajarê Mêrdînê gelek şirovê û nêrîn hene. Li gor Hammer, fermandarê Îranê Ardeşîr, bi qewmeke şerker, bi navê Mardeyan hatine û li vir cih bûne, ji ber ve yeke navê bajar bi deme rê bûye Mêrdîn. Li gor çavkaniyên Sûryaniyan "Marde" wateya wê keleh e. Ev nav ji wir hatiye. Niha navê Mêrdîn di çavkaniyên Ereban de weke "Maridin" derbas dibe û iro jî ev nav tê bikaranîn. (Acar, 2016, r, 22-23).

Mêrdîn bajarekî Bakûrê Kurdistanê ye, ku îro dikeve Komara Tirkiyeyê. Bajare Mêrdînê ji başûrê xwe ve bi Rojavayê Kurdistanê, ji rojhilatê xwe ve bi Sêrt û Şîrnexê, ji bakûrê xwe ve bi Amedê û ji rojavayê xwe ve jî bi Rihayê hatiye pêçan. Hejmara niştecihên wê 862.757 kes e. Qezayê bi Mêrdînê ve girêdayi ev in: Qoser, Artûklû, Nisêbîn, Midyad, Mehser, Dêrika Çiyayê Mazî, Şemrex, Kerboran, Stewr û Rişmil.

Bajare Mêrdînê, Mardon, Mirde an ku Marde yek ji navdartirîn û kevintirîn bajarê Mezopotamyayê ye. Bajar li ser çiyayekî ava bûye. Keleha wê ya kevn, hemû rêyên bajêr bi xwe ve girê dide. Ji Keleha Mêrdînê re "Mîrê Kelahan" hatiye gotin. Di dirokê de gelek qralan xwestiyê wê têxe destê xwe, lê Keleha Mêrdînê rê nedaye wan. Bajar li başûrê kelehê ava bûye. Xanî li dû yê din, bi hevdu ve hatine girêdan. Kevirên

wan yê spî û zer ji bo avakirinê hatine peyde kirin. Bajar bi ava xwe ya hênîk û xwezaya xwe ya balkêş ve navdar e. Bakûrê wê cihê bexçe û bostanan e.

Di dîrokê de ji bo bidestxistina bajêr şerên giran çêbûne. Berî çêbûna Mesîh, Aramiyan û Farisan şerên giran kirine. Demekê Rom li vir mane. Bi hatina îslamiyetê ve di dema Omerê kurê Xettab de, hatine bi ser bajêr û bajar kontrol kirine. Kurdan di dema Merwaniyan de bajar bi baştirîn îdare kiriye. Piştî Artûkî li vir bi cih bûne. Bajar, bi aqilmendiya Idrîsê Bedlîsî, di dema Selîmxanê kurê Sultan Beyazît de ketiye kontrola Osmanliyan.

(https://ku.wikipedia.org/wiki/bajarê_mêrdîn)

2.2.GUND Ê MEZREYÊN BAJARÊ MÊRDÎNÊ

Bebilcewz, Bihêrkê, Bilalya, Bixêdîk, Bîrik, Bîrtewa, Bîrzirav, Bozqetrê, Cewzat, Çal, Çeltûk, Çilkanîkan, Dara, Dêra Xerabe, Zehferan, Dêrdûk, Dikûk, Diyarê Dêrê, Dîbek, Domuza, Ehmediyê, Embarê, Eqres, Girherîn, Girmasek, Gocek, Golyêt, Gundikê Heydo, Gundikê Hilo, Gurgurîn, Hecîxela, Hindula, Kaniya Şêx, Kanîguriyê, Kuçûka, Kuferdel, Kurka Çeto, Mensûryê, Mûsîka, Pîrebok, Qelendera, Qelitmera, Qeraşîka Jor, Qeraşîka Jêr, Qesra Ehmedê Xêro, Qesra Qelenderan, Qews, Qurdîs, Sarinc, Sirêçk, Şatih Şeqlan, Şevreşk, Şexan, Siltan Şêxmûs, Tilşihîr, Tiwêrik, Xanika Jêr, Xanika Jor, Xerabderbê, Xirbêqeblo, Xubêr, Xudûr, Zaqirt, Zeytûna, Zêdyê.

(<https://ku.wikipedia.org/wiki/Bilaliya>)

3.LÎSTIKÊN HERÊMA MÊRDÎNÊ

Di xebata me de tê dîtin ku lîstik li ser mirovan, nemaze li ser geşedana zarokan tesîreke mezin pêk tîne. Zarokan, ji aliyê fizîkî, zihnî, zimanî û civakî pêş ve dixê. Kêfxweşî û tîrêjên hevaltiyê pêk tîne. Civaka ku zarok tê de dijîn bi xwe re rêzikên xwezayî diafirîne. Lê di vê veqetandinê de rêzik ne teqez in. Li gor şert û mercan têne guhertin. Hinek lîstik bi tena sera xwe, hinek bi komî tên listin. Hinek li derve, hinek jî li hindirê malê tên listin. Lîstikên ku me berhev kirine, temêne wan ji 5 salî dest pê dike, heya mirovên gihîştî berdewam dike. Me ev lîstikan di sala 2021 an de bi rêya hevpeyvîn û çavdêriyê peyda kir. Bi giştî 26 lîstik in, ji bilî lîstika Qoqla, keçîk û kurik

dikarin hemûyan bi hev re bilîzin. Ji van lîstikan hinek zîndî ne, ji aliyê zarok û gihiştîyan bi awayekî xwezayî têne parastin. Hinek jî, ji ber amûrên dijital (telefon, tablet, TV), bajarbûyin, û derfetên civakê nayên lîstin. Em ê jî li gor nerînan li ser lîstikên zarokan yê qedîm yê li herêma Mêrdînê bisekinin.

3.1.Dar û Pelik

Herî kêmbi du kesan ve tîn lîstin. Keçik an kur li derve dikarin bilîzin. Pelik kurt e, dar dirêj e. Her du aliyê pelik tûj dikin, datînin ser du keviran, darê li pelik dixin, pelik diheri cihêkî dûr, cihê ku pelik lê dikeve ji wir de berdewam dikin û diavêjin ê herî nêzîk biavêje û li pelik bixe bi ser dikeve.

3.2.Laga

Herî kêmbi sê kesan re keç an kur dikarin bi hev re bilîzin. Ev lîstik li derve tê îcra kirin. Bi keviyek girover û kevirên pehnikî tê lîstin. Ji bo gokê cihêkê tê nişan kirin, ji cihê gokê lingek li du yeke heta bîstan tê jimartin û xetek ji bo kevir avetîne tê diyar kirin. Yek dibe pîrik, li ber goka(kevirê girover) xwe disekine yê din jî bi kevirên xwe ye pehnikî li xeta ku hatiye diyarkîrî li gokê dixin, heta ku pîrik gokê rast bike, dayine şîna wê; divê yê din jî birevin cihê xwe. Pîrik piştî rastkirina gokê, bigîhîje destê xwe li kesekê/î bixe, ew kesa dibe pîrik. Heya ku zarok ji lîstikê aciz bibin, bi vî awayî berdewam dikin.

3.3.Heftok

Herî kêmbi du kesan ve tîn lîstin. Bi penç keviran dor bi dor tê îcra kirin. Di serî dê lîstik bi çend kopriya encam bibe ew tê diyar kirin. Dora kê be, her penç kevirên xwe diavêje erdê. Beşe vê lîstikê; yeka yeka, dido dido, sisê sisê, tepişk, kopri ye. Bi yeka yeka dest pê dike. Bi destekî kevir bi hewa dixê ji erdê radihêjî keviyekî heta ku biqede. Ji bo didokan û sêkan jî ev rewş derbasdar e. Di tepişk(dörtler) de keviyekî didin alî û bi çar keviran dilîzin. Herî dawî de kopri tê lîstin. Di vir de bi destekî; tiliya pêşî û tiliya ortê kopri tê çekirin, da ku keviran bi hewa xîna û tê re derbas bikin. Lê belê dema ku kevir bi hewa tê xistin, divê destê yê ku dilîzi li kevirên din nekeve, ger lêkeve dibe dora yê din.

3.4. Heyv û Simbil

Bi du kesan re tên lîstin. Weke lîstika ‘*yazî tura*’ ye. Di serî de her yek ji xwe re ruyekî pereyê hildibijêre. Yek dibe heyv û yek jî dibe simbil, piştî kevir li diwarekî dixin, an jî diavêjin ser destê xwe kê çî bijartibe heyv an jî simbil ew bi piwanekî bi ser dikeve.

3.5. Xar (bilye)

2-10 kes dikarin bi hev re bilîzin. Li derve an jî hindir tên lîstin. Di xetekê de xar bi navber navber sê an çar heb tê rezkirin. Ji bo destpêkirinê nezî metreya ji xara yekemîn sînora tê dîyarkirin. Ji wê xeta han pê ve xar tê avêtin. Mebest ew e ku kî xarê li xarekê din bixe ew bi ser dikeve. Heta ku di destê kesekî de xar nebîne berdewam dike.

3.6. Malik

Bi tena sere xwe, an jî bi çar penç kesan re dikare bê lîstin. Bi gelemperî keç vê lîstikê dilîzin. Bi firaxên malê an jî ê ji derve hatine dîtin tên lîstin. Her zarok rolekê (Dê, bav, pîr, kal, mamoste, firoşker, bijîşk) digire, li gor rolê rolên xwe di lîstikê de cih digirin. Bi tena serê xwe jî, alavên ku di destên wan de an jî yê ji derve hatine kirin li gor hezên xeyalê xwe diafirînin. Ev lîstik, bandoreke hestî-civakî derdixe holê. Lewra rolên civakê, berpirsiyarên dê û bavê xwe, berpirsiyarên birayê û xwişka xwe an jî berpirsiyarên xwe hîn dibe. Di heman demê de rêgezen jiyana rojane bi awayekî xwezayî tînin cih.

3.7. Sobe (veşartok)

Herî kêma bi du kesan tê lîstin. Zarokek bi zûgotinokê mîna “vîngo vînkes pîrka we ez” dibe pîrik. Piştî diwarek an jî dîrekek wekî qelê tê nîşankirin. Pîrika me berê xwe dide qelê û çavên xwe digire. Heta sedî dihejmêre. Di ber hejmartinê re lîstikvanên din diçin xwe vedişêrin. Gava ku pîrik zane ku hemûyan xwe veşartin, çavên xwe vedike. Piştî çavê xwe vekir li wan digere. Armanca wî/wê ew e ku wexta ku çavên wî li lîstikvanan ket bibêje “sobe” û di wê deme de bazde dest bi qelê bide. Heger pîrikê wisa kir ango lîstikvan hemû “sobe” kir û şewitandin bi ser dikeve û ji pîrikê jî rizgar dibe. Li şûna wî kesê ku ewilî hafî sobekirin dibe pîrik. Heke na, lîstikvanek tenê jî ji pêşiya pîrikê qelê sobe bike, pîrikbûna wî/wê dewam dike.

3.8.Sê Quçê

Herî kê m bi şeş kesan ve û li derve tèn lîstin. Di serî de lîstik di çenda de tê qedandin ew tê diyarkirin. Piştê du kom tèn çêkirin hejmara her komê wekhev tê dabeşkirin. Quç kevirên mezin in, bi navbereke tê rêzkirin. Di navbera her du koman de divê nêzî bîst metreyan navber hebe, da ku kevirên biçuk li kevirên mezin(quç) bixin. Dişibe bowlinge, lê di vir de du kom hene. Her du kom li hember hev in. Dora kîjan lîstikvanî hat kevirên xwe diavêje. Kîjan kom, hemû quçên taximê ê li hember xwe biavêjin erdê, ew kom bi ser dikevin.

3.9.Qoqla

Herî kê m bi sê kesan ve tèn lîstin, yek dibe pîrik, topê datîne erdê û li ber topê çavên xwe digire, heta sedî dihejmêre. Heya ku hijmartina xwe biqedîne, divê yên din jî xwe veşêrin. Di encamê de pîrik dema ji topa xwe dûr dikeve, zarokek diçe lingên xwe li topê dixê, diavêje cihekî dûr wê demê yên ku ji aliyê pîrikê ve hatîne dîtin heta ku pîrik dîsa topê datîne şûna wê dikarin xwe veşêrin.

3.10.Çavgirtinkê

Herî kê m bi du kesan ve tèn lîstin. Keçik an kur bi hev re dikarin bilîzin. Yek dibe pîrik, çaven wî/wê ten girtin. Lîstikvan li dora pîrikê digerin, destê xwe didin û direvin, çavên pîrikê girtiye, kê pêşî zêft bike ew a/ê ku girtiye ew dibe pîrik. Ji bo ku zarok nekevin rewşeke xetere û zerarê nebînin divê lîstik li cihekî ewlehî bê lîstin.

3.11.Çeqalîk

Bi tena serê xwe an jî bi komî dikare bê lîstin. Çeqalîk jî guliyên darê tê çekirin. Her du aliyê vî amûrî bi lastîkekê girê didin, ji bo ku kevir li ser bisekine şûna kevirêkî dihêlin, kevir li ser lastîkê datînin; pêşiyê bi qewetekî xurt lastîk paş de dikişinin, piştê kevir berdidin, li ku nişan girtibin li wir dixin.

3.12.Teyare

Bi tena sere xwe an jî bi komê zarok re dikare bîn lîstin. Bi gelemperî kur vê lîstîkê dilîzin. Ji kaxezan an jî bi naylon û textîkan balafir tê çekirin. Benekî nêzî sed metreyî dirêj peyda dikin piştê bi textîkê balafirê tê girêdan. Benê teyarê hêdî hêdî tê berdan û tê firîn. Armanc ev e ku teyarê bifirîne cihê herî bilind, da ku di asîman de xuya jî neke.

3.13.Zîzok

Bi tena sere xwe an ji bi çend kesan re dikare bê lîstin. Keçik an kur dikarin bi hev re bilîzin. Li ser cihêki têtûz têt lîstin. Zîzok dişibe koniyê û aliyekî wê tûj e. Ev aliyê tûj bi awayekî lez, li ser cihê hişk têt avêtin, da ku li dora xwe bizîvire. Zîzoka kê herî dirêj dom bike ew bi ser dikeve.

3.14.Xazoz

Bi tena sere xwe an jî bi çend zarokan re dikare bê lîstin. Zarok qapaxên şûşeyên xazozan bi kevirekî rastdikin û datînin erdê. Ji lîstikvanan yek qapaxekê li yeke dixê, dema ku biqûlîpe yekê jê distîne. Heta ku qapax bi kesekî re nemîne, wê demê yê qapaxê wî/wê zêde bi ser dikeve.

3.15.Lîstikên ta

Bi du kesan ve têt lîstin. Hem keç, hem kur dikarin li derve an li hindir bi hevdû re bilîzin. Ji lîstikvanan yek ta derbasî nav tiliyên xwe dike û deseneke çê dike yê hember jî ta ji destê wê/wî derdixê deseneke jê cudatir çêdike bi vî awayî dewam dike, da ku yek ji wan xwe şaş bike. Ev lîstik masûlkeyên zarokan yê zirav pêş dixin, li ser hişk zarokan jî bandoreke erênî pêk tînin.


3.16.Heft kevir

Herî kêr bi şeş kesan ve têt lîstin. Keçik an kur li derve bi hev û du re vê lîstikê dikarin bilîzin. Du kom wek hev belav dibin. Heft kevirên rast, li ser hev têt rêzkirin, xetek ji bo avêtina topê; nêzî 6-7 metreyê têt îşaretkirin. Dora kîjan kesî têt bi her du destên xwe topê li keviran dixê, yê ku kevir avêtin erdê baz dide, yê li hemberî wan jî topê diavêjin lîstikvanên ku direvin, ji bo ew kesa ji lîstikê derkeve. Di wê demê de divê hevalên din jî keviran dayinin ser hev. Kevirên ku ketibin erdê hemûyan li ser hev rêz bike, di rêzkirinê de top lê nekeve ew taxim lîstikê distîne û bi ser dikeve. Lê wexta ku kesekî kevir li ser hev rêz nekir û ji lîstikê yek bi yek derketin, dora lîstikê têt guhertin.

3.17.Sêberg

Bi du kesan ve têt lîstin. Keç an kur dikarin bi hev du re bilîzin. Çargoşeyek têt xezkirin sê kevir rêş, sê kevir spî ne. Li ser xetekê çep û rast an jî rasterast kevir têt

rezkirin ji bo ku rêzek çêbibe divê her sê kevir heman rengî be. Yê ku heman rengî li ser xetekê sererast bike, ew bi ser dikeve.



3.18. Pêderxistinok

Herî kêr bi du kesan ve tên lîstin. Keçik an ku dikarin bilîzin. Mezinêk, zarokan li dora xwe kom dike û ji wan re li gor temen û geşedana wan mamikan dibêje. Li bende wan hinekî disekine, da ku zarok li ser mamikê bifikire û kûr bibe. Piştî hinek serbenan dide wan, ku hîn nikaribin pêderxin wê demê bersivê dide wan.

3.19. Hêklê Meklê

Ev lîstik bi vê zugotinokê dest pê dike:

Heklê meklê

Çalim çêklê,

Hestiyê kewê

Li ber kewê

Kewê firî

Apê gurî,

Hat ser vir de rî/danî...

Ev lîstik bi tiliyan ve tên lîstin, zarok tev destê xwe datînin û tiliyên yên wan bi peyvan tên hejmartin û peyva dawî li ser kîjan tiliyê bisekine ew kes wê tiliya xwe qat dike, ev yek dîsa dubare dike û yê ku ewil pêçiyên wî hemî tên qatkirin ew ji lîstikê

derdikeve û yê mayî dewam dîkin dîsa yê ku tiliyên wî/wê hemî bèn qatkirin ew jî lîstikê derdikeve û ev tişt heta ku kes biqedin dewam dike yê kudimîne dawiyê bi ser dikeve.

3.20.Çizgî

Li derve herî kê m bi du kesan ve tèn lîstin. Li ser derenceyan jî yekê heta pencan hejmar tèn nivîsandin. Kevirê pehn radihêjin, bi lingan yek bi yek jî jor dadikevin derenceya pêncan. Divê kevir bi lingekî û carekê de bê avêtin. Dema ku tê ya pêncan, kevir datîne ser serê xwe û bi destê xwe çavên xwe digire, da ku kevir nekeve û derkeve derenca yekemîn. Bir serkeftî bigihêje derenca yekemîn, piwanekî distîne.

3.21.Lîstikên topê

Li derve an hindir tenê an bi çend kesan ve bi her awayî tèn lîstin. Lîstikên topê carinan jî kaxezan, naylonan, carinan jî ji goreyan tèn çêkirin. Amûra topê li gor alavên li malê nayên bikaranîn, yan jî ji alavên derve yên avêtî tèn afirandin. Ev jî hêzên xeyalên zarokan diyar dîkin.

3.22.Can

Herî kê m bi 4 kesan ve tèn lîstin. Di serî de lîstik wê piştî çend hejmaran biqedê tèn diyarkirin. Di vê lîstikê de du kom li hemberî cihê xwe digirin, du heval yên heman komê diçin ber bi du aliya. Di navbera her du koman herî kê m deh metre tèn nişankirin. Lîstikvaneke dijberî komê, dikeve navbera her duyan, topê diavêjin ê ku di ortê de ye, ku top lêkeve ew jî lîstikê derdikeve. Koma din dema ku topê biavêje û li wan bikeve jî lîstikê derdikeve. Lê yê/ya ku di ortê de topê bi herdu destan bigire canekî distîne. Dema ku top li yê can stendiye bikeve jî ber can ku zêft kiribû mafê wê/wî heye û dikari dîsa bilîze. Dema ku ew derkeve A/Ê din dikeve navbera wan. Ya/yê herî dawî bibine, divê heft cara di navbera koma ku li dijî wan de biçe û were, di heft caran de çû û hatinê de top lê nekeve ew kom bi ser dikeve. Bi vî awayî lîstik berdewam dike da ku dora koma din bê.

3.23. Xanîk

Bi tena sere xwe yan jî biçend kesan re dikare bên lîstin. Ev lîstik li ser çêkirina xaniyan hatiye avakirin. Yanî em dikarin bibêjin lîstika zarokan a avahîsaziyê ye. Alavên vê lîstikê carinan qerton in carinan text in lê bi gelemperî herî û kevir e. Hem keç hem jî kur dikarin vê lîstikê bilîzin. Divê em ji bîr nekin ku di navbera keç û kuran de hevpariyê peywirî heye. Kurik xanî çêdikin qîz jî alavên ji bo xanî peyda dikin û bi gihayê ku ji derve hevdanin mala xwe dixemilînin. Ev lîstik hêzên xeyalên zarokan geş dikin, çêkirina û qedandina karekî hînî zarokan pêk tînin. Lewra; zarok tiştên ku çekiribin qet naxwazin xera bibin

3.24. Zo-fer

Herî kêma bi du kesan ve keçik an kur dikarin bilîzin. Li derve an jî li hindir tîn lîstin. Lîstikvan li hemberî hev rudinin, di navbera wan de komek behîv heye. Yek ji van lîstikvanan, deste xwe diavêje koma behîva û kulmek behîv radihêje yê/ya hember texmîn dike, da ku behîvên destê wê/wî zo(çift)'ye an fer(tek) e. Dema ku çewt pê derdixe, di destê wî/wê de çiqas behîv hebe ewqasî dide yê ku hemberî xwe. Lîstik bi vî awayî berdewam dike.

3.25. Nehberg

Bi du kesan ve tîn lîstin. Lîstikek li ser stratejî û hiş e. Di destê her lîstikvanî de neh kevir hene. Rengê van keviran ji hev cuda ne. Bi zûgotinokekê lîstik dest pê dike. Li ser textekî, li ser betone, an jî li ser pêlikekê tîn xêz kirin. Divê lîstikvan sê keviran asûmanê(*yatay*), sê keviran çikanî(*dikey*) li ber hev dayine, da ku rêzek çebibe. Kî rêzekê çêke, wê demê dikare kevirê berevanê xwe bistîne. Dema ku rêz çebibe, berevan nikare wê rêzê xera bike, an wî kevirî jê bistîne. Dema ku di destê lîstikvanan de kevir nemîne, li ser textî, tîne dikarin bi gavekê, li aliyê çepê an jî aliyên rastê kevirên xwe bileqînin. Kijan lîstikvan sê kevirên heman rengî bîne ser xetekê dîsa dikare kevirên hevalên xwe rahêjê. Di dawiyê de dema ku sê kevir bibîne lîstikvan dikare kevirê xwe bibe her derê, lê belê bi gavekê tîne. Dawiyê kevirê kê du heb bibîne ew têk diçe.

3.26. Îstop

Lîstika keçik û kuran e. Herî kê m bi sê kesan ve tên lîstin. Lê lîstikvan çiqas pir bibe, lîstik ewqasî xweş derbas dibe. Keçik û lawik hem cuda hem jî dikarin jî bi hev re bilîzin. Her wext li derve tê lîstin. Ji bo lîstikê topek pewîst e. Lîstikvan ku bixwazin berî lîstik dest pê bike dikarin navê xwe biguherin. Di sêrî de lîstikvan hemû li dereke fireh kom dibin û bi zûgotinokêkê pîrikekê hildibijêrin. Paşê ev pîrik topê digire û heya ku jê tê diavêje hewayê. Gava top avêt, navê yeke/yekî dibêje, ew kesa/ê ku navê wî/wê hatiyê gotin divê li hewa topê bigire navekî din bêje; heke ku negire top bikeve erdê dibêje “îstop”. Piştê yê din heta ku ji wan bê ji pîrikê dûr diçin. Lîstikvan, piştî “îstopê” şûna xwe de disekinin û cihê xwe diyar dikin. Pîrikê piştî ku top zêft kir divê topê li lîstikvanan bixe. Top li kê bikeve ew dişewite û dibe pîrik. Di lîstikê de top sê caran li kê bikeve ew ji lîstikê derdikeve. Lîstik bi vî awayî heta ku du kes bimîne berdewam dike. Ev lîstik li ser masulkeyên zarokan bandoreke erênî pêk tîne.

Di vê xebatê de me berhevkirina 26 lîstikan kir. Ev lîstik bê guman di jiyana zarokan û heman demê di jiyana navseran de de roleke sereke digire. Xweşxwextderbasbûna zarokan bandoreke girîng li ser geşedana wan pêk tîne. Di navbera zarok dê û bav de pireke ji hezkirinê saz dike. Her wiha ev pira hezkirinê, ji bo zarokan gihîştineke bi tendurustî ava dike, şenseke mezintirîn bexşî zarokan dike.

Tablo 1: Li gori cih polînkirina lîstikên zarokan

Lîstikên Ku Li Derve Tê Lîstin	Lîstikên Ku Di Hindir De tèn Lîstin
Dar û Pelik	-
Laga	-
Qoqla	-
Çizgî	-
Xar	Xar
Malik	Malik
Teyare	Pêderxistinok
Lîstikên Ta	Lîstikên Ta
Zîzok	Zîzok
Rêz	Rêz
Sê Qûçê	-
Heklo-Meklo	Heklo-Meklo
Xazoz	Xazoz
Çeqalîk	Çavgirtinkê
Sobe(veşartok)	Sobe(veşartok)
Heft Kevir	-
Lîstikên topê	Lîstikên topê
Can	-
Îstop	-
Zo-fer	Zofer
Xanîk	-

Tablo 2: Li gorî hejmarê polînkirina lîstikên zarokan

Lîstikên Komî	Lîstikên bi tena serê xwe
Malik	Malik
Laga	Zizok
Çavgirtinkê	Teyare
Sê Qûçê	Xazoz
Qoqla	Çeqalîk
Heft kevir	Xar
Heklo- Meklo	-
Lîstikên topê	Lîstikên topê
Sobe	-
Heftok	-
Dar û Pelik	-
Pêderxistinok	-
Can	-
Îstop	-
Xanîk	Xanîk
Nehberg	-
Zo-fer	-

Di tabloyan de jî hatiye nîşankirin ku, lîstikên herêma Mêrdîn curbicur û rengîn in. Lê piştî teknolojiye û guhertina çandê êdi zarok di hindiran de bi telefon û teknolojiyê eleqeder dibin. Ev jî eşkereye ku pêşveçûyina jiyana dijîtal bandoreke mezin bi taybetî li ser zarokan, di heman demê de jî li ser dê-bav jî dike.

ENCAM

Lîstikên zarokan di nav folklorê de berhemên sereke ne. Ji ber ku lîstikên zarokan ji bo neqilkirina çand, nîrx û rêzikên civakê, kevneşopi û adetan wesifeya pireke têkûz digire. Ev pir bê guman di navbera zarok û nîfşên peşerojê de bendekî ewlehî pêk tîne. Ev bend her çiqes tekûz be, girêdana zarokan bi jiyane ew qas geş dibe.

Me di vê xebata xwe de pênaseya lîstikan, bandora li ser geşedana zarokan û dîroka lîstikan bi awayekî kurt rave kir. Lîstik li ser geşedana zarokan çiqas tesir dike, li ser hiş û hestên zarokan cudahiyên çawa çêdike, me ev xalên girîng diyar kir.

Hem di pêvajoyê berhevkerinê hem di hevpeyvînan de me gelek agahiyên guhertî bi dest xist. Lê divê em diyar bikin ku ev encamên me bidest xistiye, tenê bi vê qadê û bi vê xebatê sînordar e. Ji bo hemû deverên Mêrdînê ne derbasdar e; ji ber ku em yek bi yek negihîştine wan gundan.

Di pevajoja hevpeyvîna de em rastî hinek daneyan hatin. Ji ber hin derfetan, çend lîstikên ku me berhevkeribû nayên îcra kirin. Minak lîstika “se qûçê”, ji ber qadeke fireh û ewleyî; lîstikên “qoqla, laga, xanîk” ji ber amûrên dijîtal, jiyana bajarbuyînê nayên lîstin. Dîsa lîstika “Zo-Fer” li nav rezan, bi behiva ve tîn lîstin, nîfşê nû ji vê lîstikê ne hayedar in. Ev xebat mebesta me mafdar dike. Ji ber ku me di serî de nişan kiribû ku ji bo nîfşên nû bizanibin, hayedar bin û lîstikên wan bîn tomarkirin û wenda nebin. Jihevduketina mirovan ve çend encam derketin pêş;

- Lîstikên komî li gor berê kêr bûne.
- Sêrpehatiyên neqilkirinê û sûdwergirtina lîstikan guherîye û di navbera nîfşan da pêwendî kêr bûye.
- Amûrên lîstikan her ku çûye ji yê xwezayî vegeşîyayê yê fabrikasyonan. Minak; bere ji bo lîstika malikan ji derve alav dihat dîtin, niha hemû alav naylon û fabrikasyon e. Ev jî bandora der û dorê li ser lîstikan diyar dike.

Çi hêsan çî zor çî dirêj çî kurt jî be di hemû lîstikên zarokan de pêşamadehiyek heye. Heger hîlbijartina pîrikê pewîst be, bi zûgotinokekê teqez tê diyarkirin. Lîstik her çawa be, li ku bê lîstin zarok ji dil dikevin nava lîstikê, car caran ji xwe re dinyayekê xeyalî ava dikin. Xwestekên xwe, gazind û gilîyên xwe, xeyalên xwe bi vi awayî eşkere dikin. Di hin lîstikan de jî zarok bi tevgerekî ciddî û bi profesyonelî qaideyên lîstikê pêk tînin.

Di encamê de em têgihîştin ku di lîstikên gelêrî yên herêma Mêrdînê de kelecana, kêfxweşî, hevparî, meydanxwendin heye. Zarok dema ku van lîstikan îcra dikin axaftinê, motîvebûn, hezkirin, xweşdîtin û hîrmetgirtinê hîn dibin. Ji ver van hestên erênî, zarok di heman demê de hersbûn, berevanî û têkçûnê jî hîn dibin. Jiyan ne tenê bi xweşiyê dorpêç kiriyê, divê zarok rûyê cihanê yê xerab jî bibîne. Zarok dema ku her du aliye rasteqîn bi hev re dibîne amedakarêya jiyane jî di heman demê de pêk tîne. Bê guman ev xala girîng têkiliyêke xurt di navbera zarok û civakê de çêdike.

Hêvî dikim ku her zarok bi çand û hunera xwe, bi ziman û edebiyata xwe têr û tije bijî, lîstikên wan her dem zindî û mayînde bimîne. Dîsa hêvî dikim ku jiyana hemû zarokên cihanê di xweşî û aramiyê de şareza bibe.

ÇAVKANÎ

Acar, S.(2016).Bilecik Şeyh Edebali Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Mardin Tarihi Bibliyografyası Yüksek Lisans Tezi:Bilecik.

Akın, E. (2021)Çocuk Oyunları ve Oyunların Bireylerin Gelişimine Katkısı (Mardin Çocuk Oyunları Örneği) Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi 9(3)

Arslan, A.(2017)Geçmişten Günümüze Uzanan Süreçte Oyun ve Oyuncaklardaki Farklılaşmanın İncelenmesi, International e-Journal of Educational Studies (IEJES)70-71

Artan, İ. ve Bayhan, P.(2013), Çocuk Gelişimi ve Eğitimi, Ankara: Morpa Yayınları.

Başak, A. (2019), “Teza Lîsansa Bilind Analîzek Fonksiyonel Derbarê Lîstikên Gelêrî Yên Herêma Silopiyayê De”, Zanengeha Artukluyê Beşa Edebîyat û zimanê Kurdî.

Bedirhanoğlu, I.(2011),İlköğretim I. Kademe Öğrencilerinin Serbest Zamanlarında Oynadıkları Yöresel Çocuk Oyunları. Yüksek Lisans Tezi: Erzurum.

Güleryüz, H.(2013),Yaratıcı Çocuk Edebiyatı. Ankara: Edge Akademi Yayınları.

Güneş C. (2021), Geşedana hişî û zimanî di serdema zaroktiya pêşîn da. Folklor û Ziman. 2(1), 97-115.

Kayhan Canlı, S.(2017), “Çocuk Oyun Alanlarının Tarihi Gelişimi” Kocaeli Üniversitesi: Çocuk Gelişimi ve Eğitimi Dergisi.

Nişeyên Zanengeha Hacettepeyê (2015). Ankara

Oyun ve Oyuncak Modülü.(2016). Ankara: Baloğlu yayınları

Rousseau, J. J. (2011). Emile ya da çocuk eğitimi üzerine, Çev. (M. Baştürk ve Y. Kızılçım), Ankara: Kilit Yayınları

Sevinç, M. (2009). Erken Çocukluk Gelişiminde Oyun. İstanbul: Morpa Yayınları

Sönmez, V. (2000). Öğretmenlik mesleğine giriş. Ankara: Anı

Subaşı, K. (2021) Lîstikên zarokan yên qedîm û berdewamîya wan li devera Hekarîyê. Folklor û Ziman. 2(1), 61-96.

Sümbüllü, Z. û Altınışik, E.(2016). Geleneksel Çocuk Oyunlarının Değerler Eğitimi Açısından Önemi ETÜ, Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi. Sayfa: 73-8

Yavuzer, Haluk. (2018). Çocuk Psikolojisi. İstanbul: Remzi Kitapevi

KESÊN ÇAVKANÎ

(Kesên Ku Lîstik Ji Wan Hatîn Berhevkin)

Nav-Paşnav: Fehime Ç.

Temen:64

Kar: Kebanî

Kîjan hat berhevkin: Dar û Pelik, Heftok

Nav-Paşnav: Rukiye D.

Temen:38

Kar: Kebanî

Kîjan hat berhevkin: Lîstikên Ta, Malik, Çizgî

Nav-Paşnav: Sidar Ç.

Temen:21

Kar: Xwendekar

Kîjan hat berhevkin: Çavgirtinkê, Can

Nav-Paşnav: Serhat Ç.

Temen:25

Kar: Bijîşk

Kîjan hat berhevkin: Qokla, Laga, Ğazoz

Nav-Paşnav: Halil Ç.

Temen:68

Kar: Hostayê Diwaran

Kîjan hat berhevkin: Xar, Sê Quçê

Nav-Paşnav: Emre D.

Temen:13

Kar: Xwendekar

Kîjan hat berhevkin: Lîstikên Topê, Sobe

Nav-Paşnav: Zîne Ç.

Temen:63

Kar: Kevanî

Kîjan hat berhevkin: Heklê- Meklê, Hêyv û Simbil

Nav-Paşnav: M.Emin Y.

Temen:34

Kar: Mamoste

Kîjan hat berhevkin: Çeqalîk, Zîzok, Sêberg,

Nav-Paşnav: İbrahim Ç.

Temen:72

Kar: Jikarketî

Kîjan hat berhevkin: Xanîk, Zo-fer, Pêderxistinok

Nav-Paşnav: Zeynep D.

Temen:68

Kar: Kêvanî

Kîjan hat berhevkin: Laga, Sê Qûçê

Nav-Paşnav: Hamdiye K.

Temen:64

Kar: Kêvanî

Kîjan hat berhevkin: Nehberg, Heft Kevir

Nav-Paşnav: Leyla A.

Temen:29

Kar: Kêvanî

Kîjan hat berhevkin: Îstop



T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Projesi

Polînkirina Lîstikên Zarokan

Yên Herêma Mêrdînê

Cennet ÇELİK

21721012

Danışman

Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mardin - 2023